

# Jîn

Jimara 12

Heyva Nîsanê 2007

Vercinye, Emrîke

perê - 1


Êk ji cejinê mezî li Emrîke “Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîh” e. Hîkmeta Emrîke îcaze ji şulê hey, dêr program u stran yê teybet yê heyn, u miruv diçin mala êk u dû bu şîvek xuş.

Li hemandem, wek Cejina Deykbîna ‘Îsaî, Cejina Rabîna ‘Îsaî bî demê çûna sîkê u demê kîrînê. Gelek Emrîkî mebesta rast ya Cejina Rabîna ‘Îsaî nizanin. Mebesta wê kêvîrîşk u hêk u çiklêt u cilket nî u pêlavêt nî nîne. Belê, mebesta wê ‘Îsa ye, u ‘Îsa yê Rizgarker yê dinyayê.

Bîne bîra xu – çîroka heyva çûî – pêxember Musa Cihî ji destê Fir’ewnî xilas kirin. Demê Musaî u Cihîa berxa qurban kirin u xwîna berxa ser dûmelbena u serdera malêt wan, Xudanî xwîn dît u “derbaz bî” malêt wan u ne çû jur ve malêt wan u



kurrêt wan yê nexirî ne kuşt. U ji ber hindê navê cejinê “Derbazbîn” e. Navê wî berxe ku qurban kirî (u xwarî) “Bexê Derbazbînê” bî.



Yuñenna pêxember ji berî ‘Îsaî bî. Wî belîsa ‘Îsaî u gute xelkê, “Ew Bexê Xwidê ye. Ewê gunneha dinyayê radikit.”

Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîhî temamkîrînê Cejina Derbazbînê çunku ‘Îsa – miruvek temam u ne gunnehbar – bî Bexê Derbazbînê, qurbane bu hemî dinyayê. Tu dişê çîroka rast ya Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîhî li pera 3 bixwînî.

Buçî Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîhî gring e? Gring e çunku mirin u veşartin u rabîna ‘Îsayê Mesîhî binyat e Incîlê li ser avakirî ye. Buçî? Dû mebest in:

(1) Heker ‘Îsa – bexê qurbanê temam bu gunnehê me - ne mir, ye’nî hêsta me da qurbanê gîanewera kirî ban. Xwîna ga u berxa gunnehê xelkî nabit. Çunku Xwidê gut xelkê qurbana gîanewera bike, belê ji ber bawerîa miruva u ta’eta Xwidê, Xwidê gunnehê wan burandin. Belê xwîna qurbanekê temam – ya miruvek ne gunnehbar bî – gunnehê me dibit heker em qebîl bikin. Ew miruvê bê gunneh ‘Îsa ye. U heker em bawerîê bi ‘Îsaî bînîn, belê dê gunnehê me burit u dê bu me jîana her u her bit.

(2) Heker ‘Îsa piştî mirnê ne rabî ba, belê Filehatî da bit temam wek hemî dînê dî – pêxemberê wan yê mezî mirî ne. Belê bi şîanê Xwidê, ‘Îsa ji mirnê li roja sîê rabî u evroke sax e!

Qurtalkirin ji gunnehê me wek dîarî ye. Heker tu dîarîekê bidî min u heker ez venakim u qebîl nakim, ye’nî çawa bu min baş e? Ez nizanim ew çî ye u keyfa min naêt. Belê, heker ez dîarîa te vedikim u qebîl dikim, ya min e. Dîarîa Xwidê bu me jî wek êk e. Dîarîa Xwidê bu me xilaskirin ji gunnehê me ye. Xwidê ev dîarîe daî ye me bi rêka qurbankirna ‘Îsaî li ser xaçê – ew Bexê Derbazbînê temam. Heta em dîarîê qebîl ne kîn, nabit ya me.

**Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîhî pîruz bit!**